

Helbest

شعر

hijmarek

helbestvan

مجموعة شعراء

بارين أيقونة الزيتون

Barîn gerdena Zeytonê

malxane ya komcivîna Zanyarên Azad

دار تجمع المعارفين الأحرار الإلكتروني



- Navê Berhemê: *Barîn Gerdena Zeytûnê*
- Navê Daner: *Komek Helbestvan*
- Cûreya Berhemê : *Helbest*
- çêkirina tablûyê, berhev kirin û rêxistin: *Rêber Hebûn*
- Alîkarî: *Zekeriya Dawûd*
- sererast kirin: *Hesen Xalid*

çap: *Malxana komcivîna Zanyarên Azad 10 - sibatê-2018*

- Hijmara xelekirî: *41*

HEMÎ MAF EZBER KIRÎ YE JI NIVÎSKARAN RE

Mafê weşan kirina Pirtokê Ezber kirî ye ji Nivîskaran re û çapa Elkitronî Ya komcivîna zanyarên Azad re ye

[/https://reberhebun.wordpress.com](https://reberhebun.wordpress.com)

bo weşandina Berhemên we fermo têkildar bin;

reber.hebun@gmail.com



- اسم العمل : " بارين أيقونة الزيتون "
 - اسم المؤلف : مجموعة شعراء
 - نوع العمل : شعر
 - رقم التسلسل : 41
 - الطبعة: الطبعة الالكترونية الأولى-10 - شباط - 2018م
 - تصميم وتنسيق وتنقيح: ريبير هبون
 - مساعدة: زكريا داوود
 - الناشر: دار تجميع المعرفيين الأحرار الالكتروني
 - جميع الحقوق محفوظة للمؤلف**
 - حقوق نشر الكتاب محفوظة للمؤلف والنسخة الالكترونية ملك لدار تجميع المعرفيين الأحرار الالكتروني
- [/https://reberhebun.wordpress.com](https://reberhebun.wordpress.com)
- لنشر أعمالكم يرجى الاتصال بـ :
reber.hebun@gmail.com

***komek Helbestvan**

**BARÎN
GERDENA ZEYTÛNÊ**

Helbest

NAVNÎŞAN	NAV	HIJMARA RÛPELÊ
Pêş GOTIN	RêBER HEBÛN	6
BARÎN BIRÎNA GIRAN	RêBER HEBÛN	7
BARÎN	HESEN XALID	8
BARÎN	RIZGAR HISO	9
ŞEHÎD BARÎN	ZELOX EFRÎN	11
BARÎN	SEDRETTIN YÎGÎT	12
KURDISTAN	NEBIYE TOBAL HEMO	13
GIRNIJÎN	BENGÎN SULIVANÎ	14
BARÎN KÛLÎLKA KURDISTANÊ	MARAL XEZAL	15
ÇÛKA CINETÊ	NEZHET DOGAN	16
BARÎNA MIN	DILAWER EFRÎN	17
EZ BARÎN IM	SEYRAN BEKO	18
KURDISTAN BARÎN TU YE	MURAT EBIŞ	19
BARÎNA MIN	ZEHRA XELÎL	20
BARÎN KOBANÎ	BAVÊ OLYAR	21
BARÎN KeçA SERDEMÊ	ZEKERIYA EFRÎN	22
BARÎNê	YARA HEBÎB	24
GIYANÊ TE XWDAWENDA ME YE	BAWER AGIRÎ	25
KEWKUBARA çIYAYÊN EFRÎNê BARÎN	KEVOK KUYUMUC	26
BARÎNA HEBÛNê	CANO ŞAKIR	27
SIMBOLA BERXWEDANê	Elî ŞINGALÎ	29
BARÎN KOBANÎ	XEBAT ŞAKIR	30
BARÎNê BUHIŞTA JIYANê	LEYLA XALID	31
BARÎN	BêçARê KURD	32
BARÎN	MEHMET HACÎ OGLU	33
BARÎN	AMEDê XURSÎ	34
BARÎN	MERWAN GEDO	35

(pêşgotin)

di vê koma helbestan de , yê min berhev kir ji qirîn û hestên helbestvana ,diyar dibe çendî girêdana afrêneran bi xak û mirovan ti car naşke , yan qels nabe , ev pirtûka helbestî ya min xwest bi navê – (Barîn gerdena zeytûnê) be , tê berz kirin giyana gel û Hêrs û kela dilê wî , ji ber ku îro Efrîn bûye bêhtirî berxwedaneke berdewam , bêhtirî bajarekî kurd tê ser Êrîş kirin , îro bi xwe re ev berxwedanî di Efrînê pir wateyên bi şop û nirx bicih anî , di coşa şervanên keç û Xort de , di sersarî û vîna gelê berxwedêr de , yê serkeftinan di meydan û qadan de pêktînin , di vir me bêhtir Êş û birîna kûr û vekirî me anî ziman di kesayeta şehîda Efsanî (Barîn kobanê) , ya dîrokek nû ji jinê rojhilatnavînî ava kir bi gernasîya xwe , û bi riya ev kiryarên hovane yê ser wê hate pêkanîn ji komên hovan e , hat xisitîn ew maskê qirêj û kirêt ji nêritiya newêrkan , ew nerîna ku jin dibîne kole û bédeng , û tenê bû razanê û istîxwariyê , û ev têgeh jî hat hilweşandin bi çek û vîna jinê kurdistanî ,ew jinê bergeriyê dike ser ax kurdistanê di efrînê , ji ber vê jî , min dît ,wê gaveke başbe ,eger me îro pirtokek ser barîn danî , ji ber bimîne di dîroka kurdistanê yê tev şewat û êş , wek simbûla dilêrbûnê û berxwedaniya serdemê û nû vejîn kirina cîvaka sirûştî , yê karbû jina kurd bike nîşana baweriyê bi jiyana Azad û bi wate , lewre di Pakrewaniya Barîn kobanê nîrxê giyanî û zanyarî civîn , çawa jin jiyana nû diafirîne digel mêr bo nasnama gelên bînpêkirî were binyad kirin di kokê axa pîroz de , çawa ev berxwedanî wê bibe tîrêjek ji gelên rojhilatê yê hatî dorpêç kirin bi baskên îslama tindirew û bi rêbaza netewperestî , ji ber bi riya şerê jin digel mîr , gelek têgehên tarî hatin roxandin , Barîn jî bi vê qeyrana li ser wê hatî , dema ku laşê wê bi kêrê parç kirin û lingê xwe ser wê danîn , xwya kir rastî ye nêritîye kevinşopî yê bin maskê îslama siyasî xwe vedişêre , û wisa cîhana bédeng xwe dît gunehkar ,dema xwe bédeng dike ser hovîtiya wanî eşkere kirî , lewre îdî bi bandora cemaweran mecbûr bû vê rastîyê vexwend , ku hember vê kiryarê bédeng nemîne , ji ber Barîn nûnertiya jinên cîhanê hemû ya bû , tiştê bi serê wê hat pêkanîn , bi wijdan û mafê hemû jina Hat pêkanîn , ji ber vê jî hêjaye ev xwdaya pîroz were xelat kirin bi hest û peyvê helbestvanan , ev şewata bê sînor , Barîn bû hêrsa di zengelor û gewriya de ase mayê , qet dernakeve, lê wisa Jî dergeha nû jiyane vekir , jina şervan , jina kurdistanî, jina xwzayî yê naye spartin ..
silav ji giyanê te re barîn
bijî berxwedana serdemê ..
bijî kurdistan..

RÊBER HEBÛN
11-sibatê-2018

Barîn birîna giran



Rêber Hebûn

Destana me her bixwîna
 cangoriyên şêr û gernas
 tê nivîsandin ji dil
 destana Efrîna zêrîn
 hêrsa hîm û latê şil
 berxwedaniya sirûştê tê vejîndan mil bi mil
 ez li vir qet naçime dûr, nobedarê efrînê me
 ez pelê hejîr û zeytûn yê ti carî nayê weşandin
 her wisa anîn ziman, ew keç û kal û ciwan
 ew lehengan Carekê gotin bi coşî
 qîrkin bahoze û tav
 em evîndarê zevî ne , niştîmanin ser bilindî
 azadî digel me mezin bû
 ew dîroka bê regez , jê bibe şervan bi lez
 çêke ferhengê ji agir
 naveroka wî tenê
 ew viyan û berxwedan
 warê Barîn û Evista, cîgeha balindeyan
 dojeha dagirkeran , têkçûna ew roviyan
 ey şahîda şêre jin , laşê te laşê me ye
 laşê ew axa pîroz , cîgeha cangoriyan
 tu tîrî di çavê bêbextan, qîr û volkana me yî
 nêritiya wan qirêjan kete bin lingê te Barîn
 laşê te yê pê dilîstin gora ceş û çeteyan
 laşê te digrî mirovahî ya hatî qirkin
 reş dikir helwesta cîhan , serdema bêdengiyê
 şermezar kir şermîyê rûreşiyê û dirûtî yê
 tozê pêlava te barîn
 ji demê wan hêja tire
 pêlava te ji olê wanî tev qirêj pîroz tire
 pêlava te ji hovê tirka û ala wan rometire
 lê şehîda perwer û hêja tu qirîna me yî
 tu lehiya azadî yê nav xwîn û hizr û goman
 navê te wê her bimîne nav dilan û ser ziman
 tu her bimînî ber deman
 ew birîna pir giran..
 nav hiş û bîr û giyan

Barîn

Hesen xalid



Metirse...
 Tenê tirs mêrga Rovî ye ...
 belengazo...
 Hey pepûko...
 Rebeno...
 Metirse ...
 wê careke din ...
 Ew şax zîl bide ...
 ew zik Wê Avis bibe ...
 sed dê hene barînan bînin ...
 Qet ne sitewre
 Her tim dize...
 Hîn wê bize ?
 zikek pey zikekî ...
 Avista pey Barîna ...
 Wê werin vê Qadê
 Piştî mirna mirinê bi xwe ...
 Qet ne sitewre Ew zik
 ger tu bixwazê ...
 xweş bikire lehingiyê
 Bi lez bikire...
 Tîl û şaxên zeytûnê ...
 Wê bibin Barîn ...
 Her libek zeytûn...
 Wê bibe barîn ...
 Ji Sawîşka bi barin...
 Ji bin Qadê bi barin ...
 Vaye werzê biharê hat...
 De şaxên barîn bi çînin...
 Her libek zeytûn ...
 û Her hinarek...
 Barîne...?!
 Çiqas buha be ...
 Bikire ...?

Barîn



***/Rizgar Hiso/**


Li ser pirtûka bi navê Barîn
 Tîp tîp rondikan bo te dibarîn
 Dest û tilî dilerizin
 Dema navê te tê danîn
 Mîna pêlên dijla û Ferat
 rûpel ji hev diqetîn
 Şehîda Koban û Efrîn
 Şehîda Barîn...
 Di goristana gulistana
 Rojava de Tu bûyî evîn
 Tu yî xwişk heval û yar
 Tu yî keça bi hez û vîn
 Te can gorî kir û bûyî Zîn
 Te rih feda kir ji bo axa şîrîn
 Tu bû yî rêhevala Newal .
 Avesta , û Arîn
 Tu bû yî bûka çiyayên Efrîn
 Te dilê xwe ji me re kir hêlîn
 Te bi hêza xwe ji me derxist
 Hawar Ê qîrîn!!
 Navê te liser dergê Azadiyê
 de neqîşî bi tîpên zêrîn
 Tu jîyan î , tu Vîyan î ,
 Tu bûye Ala me ya rengîn
 Tu bûye berxwedaneke
 Serdemî li Efrîn ..
 Tu bû ye serhildanek germî
 Li Qamişlo û Kobanê Nisêbîn


Tu bûye destaneke hemdemî
Li Mahabad, û Hewlêr, Mêrdîn
Ey şehîda Barîn ...
Şehîda kurdên Mîtan, û lor , Arî
Te ji bîr nakin tucarî
Ronî da şeva tarî
Wek Zîlan fedekarî
Tîje hêz û hêvîdarî
Şehîda welatê Kurdistan î ..

Şehîd Barîn

* zelox Efrîn

Şîn e,, çiyayê kurmênc şîn e ..
 Ş.BARÎN dilê aşîxwazan dixemilîne
 Ji bo me Kurdan laşê xwe diteqêne ..
 Can goriya Azadiyê ye
 Govenda zarokên Kurdan e.....
 keç û xort in, lehengên serdemê ne...
 Warê bav û kalan dixemilînin....
 Bêjin lo strana bêjin dinyayê bihejînin...
 Dilê dijminan ji hev bixînin ...
 Bese ... Bese ji te re lê felekê îdî bese..
 Dem hatiye...
 Ku Kurd rojên xweş bibînin ..?
 Barîn, Arîn, evêste riya hemî şahiyane
 Ê axa pîroz bi xwîne av didin....
 Ê Çejna azadiyê dixemilînin
belê ez im ez
 Barîna dil geş.



Barîn

*sedrettin YÎGÎT

Kîjan bihar wê bê te dakeve welatê zeytûna,
 Û kîjan bayên berbangên sêwî wê ramîse rûçikê nêrgiz û Beybûna,
 Wêneyê te yê rûken maye li esmanê efrînê,
 Waye swarê azadîyê tên
 Di xurcîkê wan da kenê di bêrika mirinê da ji bîr kirî,
 Ew awirê te yê xumrî mane ji çevên aeytunî,
 Êdî pîrozî li ber te şermokin ey BARÎN,
 Di hembêza bajarekî berxwedêr da
 Min nalîna te xwedî kir
 Û wek pel ' ekî belhewêskê min xwe birîna te pêça
 Ew kenê te yê mirin kuj
 Wek tîrêjên rojê dida koka darê zeytûna
 Û bédengî ya şevê zivistanê
 Bi kenê te diçirîya ey BARÎN a Kobanê
 De bêje tu çawa rojê bi kenê xwe tîne jiyane
 De serê xwe rake
 Qontarê çiyayê kurmênc bi gulik û berfîn a xemilîye
 Awirên ji çevê zeytûnî difurin
 Wek tîrekê di dilda diçike
 Û kenê te dagir dike warê şêran
 Birînê şevên sêwî helbesta te dinalin ey BARÎN
 Me digot qey ji esmana barana Dilovaniyê wê bibare
 Me nizanibû esmanekî stewr wê mirineke hov bibarîne
 Di şikeftên tarî de
 Govenda mirinê digirtin balçîmokên tezi
 Kenê li ser lêvên lertzok azadî jîn dike
 Û ramusanê welatekî bê nav
 Li ser çevên te yê zeytûnî dibûn bûka cîhanê
 Erê xwişka arîn û Avesta ya xabûrî
 Tu buye pêt û agir li ser neyar dibarî
 Baz a çiyayê kurmênc
 Ew kenê te deynê stuyê cîhan ê ye.

KURDISTAN

*Nebiye tobal hemo


Bi zad û xêr û bêre
Bi xaka zîv û zêre
Bi şerê xwe çî şahşêre...
Bi Avêsta û Barîna têre
Him jine û him mêre
Bi leheng û Egîdan re
Serî her ber bi jore
Kes bi kurdan newêre
Lê ji xwe re bi kêre
Yek li jor û yek li jêre
Weke marê zik zihêre
Çî temaşê û çî sêre
Bi kuje ev kurmê dêre
Nexwaşîya cînêre
Bûye wek pençeşêre
Her roj li me destare
Dil her bi Azadiyê re .



Girnijîn

□□□□□

*Bengîn Sulivanî




Tuye simbola
 Azadîyê û berxwedanê
 Kiryara hovayetîya...
 Li ser laşê te hatîye
 Kirin
 Zeng êxiste
 Nav nûçeyên
 Tev Cîhanê.
 Girnijîna te simbola
 Têkoşîna vê jîyanê
 Girnijîna te azadî
 Jê di bare
 Ey Barîna Kurdistanê
 Keça Bajêrê Kobanê
 Te can deyna
 Ser Efrînê
 Bi wê qaremanîya te
 Çêbûn DASTANÊN jîyanê
 Bi girnîje
 Barîna min
 Girnijîna te nîşana
 Her man
 Ê vîyanê

Odense 03.02.2018

Barîn kûlîlka Kurdistanê ye...

***Maral xezal**

Oxir be delala min
Evîna te bû birîna min
Tuye bijî di hêlîna dilê min...
Miradê te bû delala min
Îro çûna te, bi lîlandin
Em ji ber te , ser bilindin
Tu bûye hêviya Azadiyê
Me li ber te , bejin tewandin...
Te hêvî û evîn meyand
Qîrîn û hawar heland
Bin destî û lorîkan qewirand...
Te ji nûve hêvî li me vegerand ...
Barînê qade hejand.



ÇûKA BUHIŞTê

*Nezhet dogan



Ez bûm çûkê sefereke rê dûr
 Ji bo evîna xwe heval
 wek deryakek bê serî

 û bê rê û bê derî
 Ji bo çavên te yê zeytûnî...
 Stûna erd û ezman rawastiyabû ji bo min

 û te hevalê vî canî
 Ez navegerim

 lê hayê te ji hêlîna min he bî
 û tu yê devê sebeta cihazê minî bukanîye vekî

 bi hêdî, li hevale belevkê ez bigorî
 Lê desmale evîndarê minî

 ku ez eşiqê wî bûm


 ji zaroktî bila li ser kêla min
 da ku ji te hez dikim evîna vî dilî

BARÎNA MIN

***Dilawer Efrîn**

Şev çavên xwe diqiripîne
 Ji ber dengê surûdên eşqê
 Û destanên te di hemêza xweda
 bi rondikan
 lehîyên hêrs û nifrînan di barînin...
 Tenê wiha di dilê meda
 destanên bê guneh têne nivîsandin
 Barîna min ...
 di awirên çavê men da
 sed salên hêvîyan hatine veşartin
 Heya kengî
 wî nê me bi hovîtiya xwe
 li bazaran derewên xwe bikujin
 We xweda yek bi derewan çêkirî
 êdî kî wê bawer bike?
 Carna ez jî bandikim dibêjim gelo?
 .gelo ma raste ewjî nabîne?
 Eger em bimrin
 dîsa em ji qirêja we xelas nabin
 Perçeyên laşê min
 rengê xwîn a min
 kenê zarokan ê geştir bike
 Û navê berxwdan Efrînê blindtir bike
 Gulên azadîyê li ezmanê welatê min bibarîne
 Mirna min hezar rengên jîyanê diafirîne
 di nava refên ferîşteyan da
 bi navê helbesta eşqa
 dengê Barîn û Avêsta tê ji Kobanê heyra bi Efrînê
 tenê bi navê we
 helbest û surûdên azadîyê têne gotin
 li ser singa te Efrîna min



EZ BARÎNIM***Seyîran beko**

Ez bûka jiyânê me
 Riya Avêsta û Arînê dişopînim...
 Rengê sor reng û giyana mine.....
 Ticaran ji mirinê re serî natewîn im....
 Tirs ji dilê min winda bû
 Evînê hestên dilê min hembêz kiriye...!
 Dayê li ser biskên min yên hûnandî gazinan neke
 .bila dilê te ji hêris û hêsrên min re bilêlîne...
 Lo lo lo hevalo were
 Were dîlana Azadiyê veke
 Hilma min ji jiyânê re gaze gaze...!
 Ezê kelha berxwedanê ava bikim û guleke sor
 Di xewa welatê xwe de bi çînim....
 Ez sozdarê hêviyên xwe me...
 Ez îro çîroka demê me...
 Ez îro kevoka Aşitiyê me
 Ez îro rengê Evîndara me
belê ez keça ser bilind im
 Ez Barîn im .

KURDISTAN BARÎN TUYE***MURAT EBIŞH**

BARÎN MEGRÎ SERBEST BE DI GORA ŞEHÎDAN DE EW ŞEVA KU
 NASNAMEYA KURDAN DI NAVA LEPÊN XWE DE JI TARÎYÊ REŞKIRIN
 BARÎN RAKEVE SERBEST
 ÎRO JI BO WÊ ŞEVA TARÎ Û ZÎNDAN ...
 TEVAHÎ JÎYANÊ HER DER KOLAN HER DER KURDISTAN HER DER
 BARÎN HER DER EFRÎN
 KAL Û PÎREK KEÇ Û XORT ZAROK BI ALA RENGÎN LI SINGÊ XWE XISTIN KURDISTAN TUYE
 BARÎN
 EW ŞEVA KU DENGÊ TE HAT JI ÇEPERA BERXWEDANÊ JI EFRÎNÎYAN RE WELAHÎ WELAHÎ BÊ
 DENGÎ NEMA ZEYTÛNA TE JI XEWA XWE VECINIQÎ
 ZEYTÛN BESE NE EWE YÊ KU BÊ DENG BIMÎNE LI HEMBERÎ HÊRIŞA EW NE TUYE ZEYTÛN
 BAWERIM BI TE EY ZEYTÛN TU BÊ DENG NAMÎNÊ (BARÎN) KEVIRÊ KER JI -5- HEZAR
 SALAN VE BÊ DENGÊ JI BOYÎ TE JI XWEA XWE VECINIQÎ KEVIRÊ KAR LI PIŞTA MIN BINIVÎSE
 DÎROKA NÛ EFRÎN BARÎN JI KOBANÊ HAT MÎVAN LI EFRÎN DÎROK NIVÎSAND LI ÇIYAYÊ
 KURMÊNC
 LI PIŞTA ZINARÊ KEVIRÊ KER NEQÎŞAND DÎROK
 AVA BIKE KURDISTAN
 BIÇEKÎ BIDE MIN JI AVA KANÎYA XWE EZ VEXWIM TÎME TÎME KURDISTAN EZ TÎME BIÇEKÎ JI
 AVA XWE DEYNE NAVA LÊVA MIN
 BERÎ DERIM NAVA GORA ŞEHÎDAN MALA HEVALÊN XWE JI BER KU LI KURDISTANÊ WÊ
 BIPRSIN KA TE ÇI HANÎ
 JI KURDISTANÊ EZ ÇI BÊJIM GELO ÇI BEJIM EZ BÊJIM KU WELAT XERAKIRIN TALAN KIRIN
 DAYIK KAL ZAROK PÎREK KEÇ XORT ZAROK TEVAHÎ KUJTIM TALAN KIRIN ÇI BÊJIM JI
 ŞEHÎDAN RE GELO ÇI BÊJIM EZ BÊJIM DÎROK Û NASNAMAYA WELAT ŞEWITANDIN BIN ÇAV
 KIRIN !

HELBESTVAN (MURAT EBIŞH) BAJARÊ EFRÎNÊ

JI GUNDÊ QEMÎTLIQ ME TEMENA MIN SALA -(1988) LI GUNDÊ QERMÎTLIQ DAYIK BOME

BARÎNA MIN

* Zehra Xelîl

Keça welatê min
 yê gula bi bîn
 Ewan hovan
 gula min birin
 Ser û berê wê jê kirin
 Tê tim hebe
 hey gula min
 Yê mîna te qet namirin ...
 Tu bûkek bi xeml û xêze Can gorî welat parêze
 Tê tim hebe
 li nava mebe
 Ji bona me
 tu xweş hêze ...
 Bihna te li ber pozê mine
 Rengê te li ber çavê mine Ew nalîn û qîrîna te
 Ticar naçê ji guhê mine ...
 Ew navê teyî gelek giran
 Wê her hebê li ser ziman
 Bi terane em,
 gula min Sed carî bi soz
 û peyman ...

//Kobanî 2018/2/22

BARÎN KOBANÎ


*Bavê Olyar



Barîna nav birûmet
 Barîna jinxas te Miştenûr li Efrînê
 Hîn û hîn pozbilindtir kir
 Barîn tu ji rûmetê bi rûmetir î
 Tu DÊ, XWÎŞK û KEÇA min î
 Ê xwîna te yê her ji darên zeytûnan re bibe baran
 Ê Buharê bibişkuvîne
 Tu yê bibî destanek ji nifş û neviyên wê re
 Barîna jinxas
 navê te ji dîroka Turkan û Ereban bi şereftir e
 Ê xwîna te ji ola wan dûvdirêjan paqijtir e
 Tu yê her bimînî rondika di çavên me de
 Ta roja serxwebûna Kurdistanê
 De bilîlîne dayê bigrî û bilorîne
 di guhên pakrewanên xwe de
 Di dilê Arîn û Avîsta Xabûr de
 bila berxwedana şaxên zeytûna te
 Di guhên me de li dunyayê dengvedaneke bêdawî deng vede
 Bila Li esîman qîrînên zarokên te
 Berxwedana keç û xortên te
 Gelên cîhanê fêrî berxwedanê bikin
 Ê bide nasîn çawa turk, Ereb û Ardoxan Bê namûs in

BARÎNÊ KEÇA SERDEMÊ***Zekeriya Efrîn (bavê Firîşte).**

Ji bihna canê te
 Li ber hinasên hebûna te
 Çend dil û giyan ...
 Ji xwe şerim û fedî dikirin..!
 Çend gul û kulîlik dipişikivin û dora xwe
 Dikin gulîstan....



Ji peyvên lêvên te
 Pênûs li xwe matmayî ye.....
 Ristên lênûskê xwe radikşînin ber bi xeyalên
 Bê dawî!
 Pirtûkeke bê ser û ber
 Li ber xwe dide...!
 Navê BARÎNA asîmanî
 Li ser singa xwe datîne...
 BARÎN....

Barîn keça berxwedana serdemê ye...!

Şopdara Arîn û Avêsta ye.... ..

Dil li ber teviziye...
 Barîna kobanê
 Meydana şêranê
 Nîşana Efrîna rengînê...

Vê axê çi dît û çi nedît?
 Ji xwîna pakrewana avdaye.....

Li ser vê xakê
 Li ser vê qadê
 Peyv xwe digindirînin
 Deşta Aramiyê....!!
 Beden û laşê teyî pak
 Erd û asîman hejand...
 Tiris xiste dilê neyaran
 Ê dara jiyanê
 Diyarî kir bo me
 Barîna jîndar tu jînî.

CANGORIYA SERDEMÊ BARÎNE

Li ser vê xakê, dil di Rekihên bê hempade

Diperpitin....!

Bihna hinavên berbext riya doza şerefê datîne ser hêlana dilan....

Belê li ser pêlên hebûn û tûnebûnê çavên bedew li jiyaneke Azad digeriya...!

Li benda helbesteke bê nav ditekose.....!

Û hestên veşartî dibin siya bijangên xweşik de xwe dirêse ji rojê re...

Nifşeke nûgihayî ber bi tihna rojê dihiland...

Belê.....

Li ber siya bejina vejandî

Xeyal li teşiya dîwarê demê dixist.....!

Weke tayê reyhanê

Zirav û çeleng xweza dixemiland....

Bi sitrana zimanê demê

Awazên keça bê guneh

Ji lorîkên serdemê re

Dilorand....

Û weha digot :

Ez keça horî û mîtaniya me....

Xemila kulim axeke pakim...

Nîşana bedewiya

peyvên windayî me...

Surûda li ser lêvên

zaroka me....

Kenê şahiya evîndara me

Keça dicile û firatê me..

Giyana Arîn û Avêsta me

Dîroka destanekî nixumandî me....

Pênûsa axa pîroz im..

Li ser Singa me dîlana peyvan riya nexşeya hebûna mirovên ser wexte....!

Belê em çîroka welatê rojê ne .

28/02/2018

BARÎNÊ*** YARA HEBÎB (DIYA FIRÎŞTE)**

Barînê bûka Efrînê
 Neviya deşta simbilan
 Deşta kobaniya berjîn.....
 Her girnijîneke ji lêvên te
 Mirina sed saliya kedxwarane....
 Barîn ê
 Keça dilşêr
 Xwediyê canê pîroz
 Xwe li axa pak û li her dareke zeytûnê alandiye..

Welatê min navê barîn ê
 Vedibêj e
 Sembola jina serbilind
 Qehremana serdemê... ..
 Her weke Leyla qasim,
 Ê berdêliya Arîn Mîrkan e

Dîrok xwe vedigerînê
 Barînê ji mal zaroka rometî.... ..
 Her biskeke ji porê te
 Gerdeneke ji jiyana Azade...
 Ji gemrok û meydankê ye....
 Destana bav û kala ye
 Kurda Kurdistanîy e...
 Barîna kobaniy e
 Hebûna mirovan e.

giyanê te xwedawenda me ye

***Bawer Agirî**

Kî dîtiye hesin agir têk biriye?

kî dîtiye birûsk bi destûrê şewq dide?

Barîn, bû pêt û agir bi ser dijmin de barî

Barîn, namûsa me parast xwe kir hezar şervan, dijmin kir parî
parî...

kenê te bû hêza kurdan,...

çavên te bûn tîr û kevana parastinê,

dilê te bû ronahiya kelecana evîndarên dahatûyê,

tehma ku te belav kir ji destê bêrîvanekê hezar tas şîr vexwarin çêjtir e,

tîrsa û xofa ku te di dilê wan ê qerisî de çand dê ji wan re bibe ardûyê mirinê û wan roj
bi roj, kêlî bi kêlî bihelîne û bişewitîne...

tu bûyî xeyalê cejna zarokatiya me,

di nava ew qas keftaran de te navê me, hebûna me, namûsa me, canê me, xeyalên me û
şabûna me parast...

giyanê te xwedawenda me ye îdî

em minetdarê kenê te yê ji me re bû jîn in...



KEWKUBARA ÇIYAYÊN EFRÎNA RENGÎN Barîn***Kevok Kuyumcu**

Kewkubara çiyayên Efrîna rengîn
 Navê te pîroz e
 Dé em her te bi nav bikin bi serfirazî
 Lew te Stemkariya ceş û hovan
 Ne pejirand
 Ê li himber bê dadiyê
 Te şirhikên bajarî xeftan û çemçem
 Ji bejna xwe danin
 Ê te ber kir cil û bergên azadiyê
 Barîn
 Kewkubara çiyayên Efrîna rengîn
 Lehenga pakrewan
 Şehîda ezîz
 Tu gor bihişt û nemirî
 Li her hêlên cîhanê
 Keç wê bi navê te bêne bi nav kirin
 Ê fenanî taviyên biharan
 Dê bi ser dijmin de bibarin
 Ê bişkînin nîrên bê dadiyê

15.02.2017

Barîna Hebûnê

*Cano Şakir



Keska xwîna laşê te ji dilê darên zeytonan diherike,...
 Were Barîna jiyânê ,
 Ku bêhna jiyânê ji kenê te tê,
 Were ta ku te binvîsim!
 Were ta ku te bikim romana vê serdema teyî zêrîn,
 Were ta ku êşa diya te ji dîroka kore û lal re vebêjim,
 Were ta ku te bikim helbesta efsanewî û li ser rûpelên çav koriya demê te bikim
 navnîşana helbesta nûjen,
 Were ta ku pêûsa xweyî zuha bi xwîna teyî kesk tijî pesindayîn bikim!
 Were te ku çerxa şoreşê bi navê te bi reng û bixemil bikim,
 Erê were û piştta xwe nede xatirxwestinê ta ku sînoren destana te bi dengê teyî berz ava
 bikim
 Îro bilêvkirina navê te baohz û tofanan bi ser serê wan de dibarndin,
 Îro neyarên mirovahiyê kêlikên xweyî têkçûyî li ser wî laşê teyî pîroz dihijmêrin!
 Îro merovahî li pêş van dîmenan kore,
 Mal gelo merovahî hîn maye?
 Îro gurzên peyvên di destana navê te de li peyî şopa te dibezin û diherikin,
 Îro di şewata peyvên vê helbestê de navê te ji ferhenga di bin baskên xwedawendan de
 dibare Barîna sartaça hemî jîn beran,
 Îro navê te mîna stêrka geş bi ser goristana dilê Kobaniya dibare,
 Îro hemî peyv û helbest xwe bi keziyên te re dihûnin,
 Li asoyên xwedayê Efrînê raze Barîna xwedawendên bê çav,
 Li ser baskên firîşteyan di ezmanê Ahoramezda bilind bifre Barîna agir û rojê,
 Di hêlîna jiyânê de destana wêrekiya te di hêlîna Arîn û Avesta ya ser demê de ava
 dikim,
 Min li pêşberî zorbaziya destana kenê te nema karîbû xwe rabigrita,
 Li pêşberî cenga te min nema karîbû tîpên ji ferhnga tirsê di rûpelên dîroka te de
 binvîsî ye,
 Çîroka navê te kelhên zilmê li ser serê celadên ser demê de dihêrivîne,
 Sirûdên ji devê çeka te hildibin bagerên mirinê li dora neyaran dipêçe,
 Navê te sînoren welatan di dilê xwe de hiltîne,

Çavên te êşên bindestan di kûrahiya xwe radzînin,
Te peravên jiyânê bi awirên xweyî efsanewî parastin Barîna jiyânê,
Himbêza dayîkên dilsoz ji hêviya xewna te tijî azadî bûne û bi ser neqşeya welatê rojê
de dibare,
Li ser sînorên westiyayî yê welatên min navê te li ser sorih û bircan bi tîpên pîroz tîn
nivîsandin,
Li bin siya darên çavên te karwanên azadiyê zarokê deşta qelişî û zuha av didin,
Û... niha
Xwîna teyî kesk darên zeyton û hinran avdidin,
Û...
Şitl û şaxê darên jiyânê li ber gora te ji nû ve wê kad didin,

03.02.2018.

Simbola Berxwedanê

*Elî shingalî



Simbola Berxwedanê
 Tu hêvîya jîyanê
 Baz, Piling û Şêrî
 Ji bo man û nemanê

Keça Kurda RojAva
 Ji bîrnakin tolhildanê
 Xakê bi xwîna te avdin
 Li dewsa tavên baranê

Bi hezaran keçên wek te
 Hene li Kurdistanê
 Li Şingal û Mehabad
 Li Efrîn û Kobanê

Barîna Kurdistanî
 Gula baxên kobanî
 Li meydanê şervanî
 Hezar rehme li wî canî

Barîn Kobanî

*Xebat Şakir



Barîna zeytûnên xaka pîroz
 Barîna ji hinavê gelê berxwedêr
 Te bi laşê xweyî pîroz xunava azadiyê
 Ji çar perçeyên buheştê re şand,
 û bi vîna xweyî ji pola serê me mîna dera herherê
 Li zeviya xîretê şîpiya hişt,
 tu buyî gul

tu buyî Zeytûn

tu buyî dibistana xîret û berxwedanê
 te bejna xwe bi çiyayê zetûnan re pîva keça rojê.
 Te navê xwe li ser perdeya hiş û dilê mirovatiya azad nivîsand
 Tu buyî Barîna kesk ya ku rihê xwe ji zeytûnê digre,

dengê ku ji hinavê berxwedanê diqîre û

Lehenga destana çiyayê Kurmênc ya serdemê û

li asîmanê welatê rojê buye keskesor.

Îro me 33 zeytûn ji destana te hijmartin

33 gul di beçê azadiyê de çandin

Rihet raze stêra berbanga azadiyê

Aşê berxwedana serdemê bi vîna te digere û hevalên te hîn jî bi coş di govenda serdemê de
 milan dihejînin,

Silava li civata mezenên berxwedana serdemê

Evesta Xabûr û yê din bike, va vîna we bi ser dikeve û bîna we ji xaka zeytûnê difore û

zarokên Efrînê navên we li ser tîrêjên Rojê nivîsandin,

li ser pelên zeytûnên Efrînê kolan û

li ber siruda serdemê ya ku we helbesta wê afirandibû ber bi serkeftina herî mezin ve di meşe.

Barîna welatê rojê

Îro canê teyî pîroz buye sembola berxwedanê,

buye tabloya ku mirovatî bi şanazî li ber bisekine

buye rû reşî û serşorî ji bo neyaran, ha va navê te di pirtûka dibistana zarokên rojê de hat
 nivîsandin.

Rihet raze Barîna berxwedêr

Vîna te li zeviyên zeytûnê bi ser dikeve

Qîrîna te di kerika guhê neyaran dibe atom û di teqe û ji bo me dibe hermonî û dîlana şoreşê
 li ber digere.

Barîna zeviya zeytûnê

Barîna Kobanê lehenga çiyayê Kurmênc

Barîna xunava azadiyê

Bi te mirovatî şîpiya ye û şîpiya bimîne.

BARÎNÊ BIHUŞTA JIYANÊ***Leyla Xalid**

Xwedawenda erd û asîmanê
 tu pîroz î...
 Qîrîna mirovatiyê
 Hebûna eniya rûmetê barînê keça deşte sirûca ber bext...!
 Sing pola
 Bejin zirav mîna çiqilên zeytûnê lê barînê...
 Barînê nazdar û narînê
 Birîneke bê dawiyê..
 Qîrîna zarokan e
 Hawara dayîkan e
 Destê neyara dişikîn e
 Weke Kurdistanê laş bedew û rengîne...
 Dilê dujiminan parçe parçe dîke ...
 Belê welatê rojê neke girî
 Dayîka dîlkovan bilêlîne
 Xwedawendê hilîne
 Mizgîniya serfrazîyê ye
 Li wê derê xezaleke dûr hatiye
 Simbola jiyane ye
 Barîne xweşika Avêsta û Arîn mîrkanê ye..
 Min di nava xilmaşiya hembêza deşta Efrînê de dît...
 Belê di nava şax û milên zeytûnê de dimilmilî ser deşta Aramiyê û li aliyê dîtir min dît zinarek
 dihilgire çek û ber singa wê li benda giyaneke vejandî bû ku ber bi jiyaneke Azad bihelin
 Tu bû dilê welatê rojê
 Bûka Kurdistanê Barîna hêja .

Barîn

*Bêçarê kurd

Barîn ji şaxa zeytûnê?
Tayê porê te ji sîratê
Ez te nadim bi fîrقاتê
Termê teyê ku li qadê




Jê bigrim xweş îbratê!
Bila cîhan te bibîne
Xweş ibretan jê bixwîne
Teres ku arê hilîne
Bû nîşan li axîretê?!
Keko negrî ev normal e
Mi!can daye bo heval e
Ta nemînî kerr û lal e
Hêdî bes xew li te natê!
Bi saxî ev can bi sam bû
Li kesên wek wan heram bû
Hîro ji pîsan eyam bû
Ev kiryar ji ola wan tê?
Ev tev mirîdê umerin
Ew dijminê pêxemberin
Wekî hecac lawê kerin
Xweda ew dan ji leinatê!
Ez çi bêjim bê wate ye
Zendevîsta min bi xwe ye
Hewremezda banga me ye
kurdo!bike taqîbatê!
Kurdo!ev cara dawiy e
Dest bi hev din zû reviy e
Va di gêjgerînk wer biy e
Çi lewazin rev li wan tê!
Çiyayê lêlûn pir hêsan e
Pir bi same ciyê şêran e
Miştenûre li pişt wan e
Bang û meded ji xweda tê!
Barîn ji çiqîla zêtûnê
Li wan wek arê êtûnê
Ji avesta da mizgînê
Koletî bê wate hatî

" BARÎN

Te şêrîn bişîrînê Pak û şepal
 û narîn Bêwext te ji Efrînê Barîn
 te mal kir barîn
 Jinşêra
 dil ji pola Kabûsa hovên çola
 Bêçar ket dest
 Moxola Nazikten kirin
 Barîn Tu kulîlka devbesta Rêhevala Avesta
 Rûmeta me bindesta Şemala şevên tarîn
 Şînkevoka rojava
 Ji bîr nakin ti gava
 Te agir da
 hinava Disoje nabe sarîn .

*Mehmet Hacıoğlu



Barîn***Amedê Xursî**

esmera min ya xwînşîrîn
 keça min ya ji Têlîzeyneban bedewtir
 tu yî Xwişka min ya ji hinguv ê nanikan Şîrîntir
 tu yî Diya min jî
 kurman pêşîrên wê xwarin
 ew jî tu yî
 Hela di riwê min de bigirnije
 bimizice bera xwêzî ya xweda di gewriya wî de ziwa bibe
 xwedawenda qeşingyê yî tu bedewa bê hempa yî
 tu cêryên te ne hemî periyên buhiştan cêryên te ne
 Belqîsên kotiyên Sulêmanan
 Zuleyxayên nemêrê ha zenûbyayên hemî serdem
 û biyabanan Sara Xelil cêrya te ye
 Kilyopatra Monalîzên hemû serkidûmên welatên rojava Eştar
 tu yî Sadrîmos jî nîvkuştî ma
 û cardin jîyan bê ve rapelikî Leyla Qasim bû
 ji waheye ku kuştin waye cardin
 tu yî Heyv tu yî Roj Behrem Bercîs
 û her neh kewkebên din Gerdûnê cêrya te ye
 Gulên berberojkê hêviyên min in û Kurdistan tu yî .

Barîn

***Merwan Gedo**

Arîn Avesta Barîn
 Girî we kir gîrnijîn
 Birîndar jî dikenin
 Mirin jî va bûye jîn
 Barîn nameya rojê
 Kenê lêva bişkojê
 Ew mirinê nas nake
 Dijî wek paşerojê
 Sawa termê wê şêr e
 Li ber neyar sawêr e
 Sawêra wê bû şervan
 Çek jî li ber bê kêr e
 Bi kêr nayên tank û top
 Li ber sawêr bûne şop
 Ji germa dilê Barîn
 Derya xema bû dilop
 Sawêr û Reşkê Şevê
 Berê rojê dan şevê
 Rê û şop jî windabûn
 Berê dijmin ket revê
 Çete wekî dilêra
 Rahîştin şûr û kêra
 Destana herî mezin
 Cenga himber sawêra
 Ji bo Efrîna ciwan
 Laşên bê can ser hildan
 Du (2) caran xwe kir şehîd
 Bijî bûka Kurdistan .



*مجموعة شعراء

بارين أيقونة الزيتون

*شعر

رقم الصفحة	الاسم	العنوان
38	ابراهيم اليوسف	مقدمة
40	فرحان كلش	بارين ابنة الوجد
43	ليلى مقدسي	بارين
44	ماريا كباية	بارين شهيدة عفرين
45	غياث برازي	بارين
46	بنار كوباني	بارين
48	ياسر عبيد عثمان	بارين كوباني
49	رودر أحمد	بارين
50	سيران بكو	بارين عروس الزيتون
51	مصطفى أوسي	بارين الجرح العميق
53	فيروز رشك	الملائكة التي تمتهن ضحكك
55	عدنان شيخي	بارين كوباني
56	هजार بوطني	عذراء الوطن
57	نارين كوباني	بارين وجد الأرض
58	فيروشا شاه شيخموس	بارين عفواً
63	ملك علو	رقصة غياب فاني
64	سهام حسن	كوكب القداسة بارين
65	غيفارا معو	أيقونة الزيتون
66	خمكين خليل	بارين عروسة كوردستان
67	فواز خليل بشار	بارين
68	أسامة عبد الفتاح	بلادي
69	ياسر خلف	بارين
70	جان بابير	حكاية دم
72	صالح بوزان	لن يمروا
74	بانكين جنكي	بارين
76	ريبير جينجق	بارين
78	أحمد زكي	صرخة نداء
79	خليل ولو	بارين والموتى الكثر
80	نسرين عيدو	بارين زهرة كوردستان
82	عبد الفتاح نفاتي	موت من أجل قضية ما

-مقدمة -

في بارين كوباني



تلك اللبوة التي كتبت قصيدتها

إبراهيم اليوسف

كيف لاسم ما أن يرتقي إلى مقام شعرية وأيقونيتها؟

هكذا سألت نفسي، وأنا في حضرة روح سفيرة عفرين: بارين كوباني، التي استطاعت أن تهطل في أربع جهات الأرض. أن تكون ضيفة كل قارة في العالم. كل بلد. كل مدينة. كل قرية. كل شارع. كل بيت، أصدقاءً، وجمهراتٍ من النظارة، وأعداءً أيضاً، تقدم هويتها، خريبتها، صورتها، أبجدية لغتها التي تؤسسها ذراري جبال، وأنهار، ونبابيع، وسهول، وسماوات، وآفاق، وأسماء شهداء، ورموز، ليتردد صدى أحرف اسمها على السنة هاتيك الجهات كلها، لغة لغة، ضميراً ضميراً، وجداناً وجداناً، تسر سورة إنسان عالي القامة، ووطن شامخ يننُّ تحت جراحاته منذ أول تغريبة تاريخية، بعيداً عن رايته القوس قزحية، بعيداً نشيده ومؤكد، أن الإجابة عن سؤال كهذا، حفر لذاته رمزيته على صخور ذراري جبالنا الكردية، لتسلس، لأن ما قدمته لنا بارين كوباني من "أوراق اعتماد" في أفندتنا، وخوافقتنا، وأرواحنا، لكافيةٍ للتعريف بها، لتكون بذلك أطلس جغرافيا، وتواريخ، وقضية، وحلم، وبوصلة طريق إلى اليقين الذين طالما قرأته، وصنواثها، وأمثالها، من أبطالنا، وبطلاتنا، على امتداد حدود خريبتنا الذبيحة، السلبية، والمصلوبة، التي انخرطت هذه اللبوة مع سواها، من أجل استعادة الروح والحياة إليها، من دون أن تأبه بالضريبة التي ستدفعها، سيان إن رخصت، أم بهظت، شأن موكب السابقين عليها، والمواكين لها، واللاحقين بها، في دورة لن تنتهي، قبل أن يتحقق حلم هؤلاء جميعاً، في استعادة عافية ضالته، التي يقتفون أثرها جهة تلو أخرى، إلى أن يتحقق كل ذلك بينما كان العالم أجمع يتابع تفاصيل العدوان الطوراني، المدعوم بجمهرات وفلول المرتزقة، سريعي الاستجابة لنقل البارودة من كنف إلى آخر، وهم يترجمون- إرث الضغينة- بحق الكردي، عبر أشكال ما بعد الإرهاب جميعاً، من خلال توجيه حمم نيران قذائف الطائرات والذبابات على مكاننا وإنساننا، في محاولة لحرق أخضرنا ويايسنا، في أن، ناهيك عن ذلك الخطاب الإرهابي الإبادي، لكل هذا العدوان، ظهرت لنا بارين- وهي هنا الرمز المعمم، عبر ثنائيتي: الصورة والصوت. صورتها، وهي مسجاة، أرضاً، مخضبة بدمانها، بعد أن تم التمثيل بجسدها، عبر عنف ذكوري، افتراسي، ذنبي، مقابل حوارية صوتية، عدوانية، متشفية، متوعدة، مستمرنة لانتهاكاتها حتى بحق دساتير الحروب، وأخلاقياتها، لتترجم لسكان العمارة الكونية مدى وحشية أعداء بارين. أعداء إنسانها، ومكانها، ليس كمنفذين مأجورين- فحسب- وإنما كمخططين لهذا الحقد، ممن ينتمون إلى أكثر من لغة، وثقافة، لا هاجس لهم إلا محو وجود الكردي، بغرض استكمال السطو على فردوسه الأرضي، وتحويله إلى جحيم يشبه عالم ضغانهم وأحقادهم وثقافتهم الكريهة

إن بارين التي حددت خيارها، وهي تنبري لمواجهة- ما بعد الإرهاب الداعشي- مع رفاقها، ورفيقاتها، بل مع الغيارى من أبناء شعبها، إنما انطلقت من ثنائية فكرتها ذات البعدين الإنساني والقومي، المتوازين، بل المتلازمين، المتوائمين. إذ إن هؤلاء القتلة، المارقين، عابري القارات، ليسوا في صميمهم إلا أعداء للوجود الآدمي كله، ناهيك عن أن إنسانها. إنسان بارين- لهُو الآخر- بلا مرء، على رأس هذه القائمة. على رأس

قائمة مخططهم، ومطلوبهم، لذلك فقد دافعت عن كوباني، إلى أن تحررت، من دنس هؤلاء المجرمين، بعد مقاومة باسلة، لفتت أنظار العالم بأسره، وتعرف العالم بأسره على هذه الملحمة العظمى، ومن بينها بعض الأسماء العالية التي قدمت أمثولات، ودروساً في هذا الميدان، حطمت أرقام- سجل غينيس- المقاومة، بما ساهم، ومن جديد، بالتعريف بالكردي- أياً كان تصنيفه العسكري، أو مسماه، في الخط الأول لمواجهة أشكال الإرهاب كلها، سواء أكان ذلك في: شنكال أو في كوباني، وغيرهما، ليكون

...صانع معجزة البسالة، والتضحية، والنصر، في الألفية الثالثة، بلا منازع

بارين كوبياني-ابنة عفرين- والتي يعني اسمها الأول "بارين" العويل" بينما يحيل اسمها الثاني إلى مدينة كوبياني الكردية التي سجلت بطولاتها و أبطالها الذين ذادوا عنها ملاحم عظمى أدخلت اسم هذه المدينة الصغيرة إلى قلب خريطة العالم الذي راح يتابع أسطورة مقاومتها، بإعجاب كبير، لتكون بارين سفيرة عن هؤلاء اللبوات واللبوث، وهوما جعل قتلها يقدمون بأنفسهم أعظم شهادة لها، من خلال إمعانهم في التمثيل بجسدها، لأنها لفتتهم أبلغ درس مرير، من خلال مقارعتهم، على خط النار الأول، قبل أن تكتب مصيرها النهائي، ليقدم هؤلاء القتلة، الإرهابيون، على جريمة تنكيلهم بجسدها، وليقدموا بذلك، صورة عن مدى تأصل ثقافة الكراهية والانتقام والتجرد من أبسط القيم الأخلاقية المتعارف عليها، عبر التاريخ، في نفوسهم المريضة

حدث النيل من جسد بارين كوبياني كان له أثره لدى المبدع الكردي: موسيقاراً، ورساماً، وكاتباً، وشاعراً، إذ تم تناوله من قبل كثيرين، عبر وسائل التواصل الاجتماعي، كسابقة، صاعقة، أليمة، استثنائية، وكان للشعر- باعتباره الأسرع تفاعلاً مع الأحداث- حصته الواسعة في هذا التناول، من قبل كثيرات وكثيرين، وإن كانت نصوصهم ستنبأين، تكتيكاً، وعمقاً، إذ ثمة من كان تفاعله جد مباشر، مقابل من قارب نصه من هذا الحدث العظيم، ليكون للشعر صوته المدوي في مواجهة آلة الحرب التي نالت من عفرين الإيابة والشهامة- من جهة- وكوثيقة إدانة إبداعية لهذه الجريمة النكراء التي تشكل عاراً لكل من خطط لها، أو نفذها، أو ألب عليها، أو سكت، أو صفق لها، على حد سواء، ليتداخل الرمزان: عفرين الجبل الكردي وبارين القامة المقاومة

ثمة ما أريد أن أشير إليه، وهو أن الشعر إذا كان سريع الاستجابة للتفاعل مع أي حدث، فإن هذا التفاعل لا يبلغ ذروته مالم يتم التزاوج ما بين هذا الحدث وفنيته العالية، وذلك لأننا تجاوزنا تلك المرحلة التي يكون فيها الشعر مجرد تاريخ- فحسب- بل إن ذلك القصيدة التي لا تجازف بأدواتها الفنية، كاملة- أياً كان عالمها- فهي القصيدة التي ترتقي إلى مستوى الحدث الكبير قادرة أن تكون وفية لهذا الحدث، وإن كان لحضور الحدث شعراً شروطه الخاصة، كما أن لا قصيدة يمكنها أن تغدو كبيرة بمجرد اتكائها على الحدث الكبير، وإن كان حسبنا، أمام مجموعة من نصوص تناولت هذا الحدث العظيم هو أننا نستقرىء الصعقة التي مست أرواحنا جميعاً، فأشعلتها، وأجبتها، وقد كان لكل من تناول الحدث فضيلته، بما يدل على إنسانيته، ووفائه، وصدقه، ومأثرته في

..حساسيته الإنسانية

لا أريد أن أتحدث عن النصوص التي تضمنتها دفنا هذا الكتاب، باعتباري لا أبغي مصادرة حق حرية المتلقي في التفاعل معها، وتقويمها، على طريقته الخاصة، لأن مثل هذه المقدمة لن تكون إلا مجرد مفتاح أول، إلى عالم هذه المجموعة من النصوص التي كتبت بأقلام كثيرات وكثيرين من الناصات والناصرين، ممن هزتهم الجريمة الشنعاء، وجاءت نصوصهم شاهدة على فظاعة الانحطاط الأخلاقي لهؤلاء الإرهابيين، ومن وراءهم، ولتكون شهادات في عظمة هذه البطلة الكردية التي تحولت إلى أيقونة كردية عظيمة تتوأم مع جبال عفرين، وكاناتها، ومكنوناتها، وأشجار زيتونها، وسمانها، وترابها، وحجارتها، ووديانها، وأنهارها، ونبابيعها، وأطيافها، باعتبار كل هؤلاء و سواهم ممن ينتمون إلى هذه الخريطة. إلى الكردية، وكردستان، ليسوا إلا درايا لأحقاد وضغان من فطموا على ثقافة الكراهية. ثقافة إلغاء الآخر- لاسيما الكردي- من مسرح الحياة، كشأن متوارث، كما فضحته بارين التي تصلنا رسالتها، عالية الدراما، تترى، كأعظم قصيدة، وأعظم رواية، وأعظم فيلم سينمائي، أو أعظم مسرحية، وأعظم أسطورة على الإطلاق...؟!

... (بارين ابنة الوجد)



*فرحان كلش

وقف الجبل يستظل بها
 والمنارات المرمية
 في اتجاه القبور
 مازالت ترتاح على جانب
 ...جسدها الأسمر
 ووقفنا نحصد معها
 الحصى الجميل
 من جداول الدم
 ونرقد كأحلام الطفولة
 بالقرب من صوت الحزاني
 بارين كمتعبنا
 وكم هللنا لإنتصارات
 الآخرين علينا
 وكم بقينا في حروبهم
 أرقاماً بلا أسماء
 وها قد بتنا
 نهز أحجارنا لتستفيق
 وأشجارنا لتتلو أكثر
 وها قد مد الشرق سكينه
 إلى زهر النوافذ
 ومد الغرب خرائطه
